

Welat

01/04/2020

Çandî - Gîştî - Serhîwe

73

KOVARA WELAT DERBASÎ SALA XWE YA HEŞTEMÎN DIBE

8

Welat



PEYVA WELAT

Kovara Welat mûma xwe ya heştemîn vêdixe

Desteya sernivîs

2

Di 22 Avrêlê de ku helkeftî roja rojnemegeriya kurdî ye, di vê roja pîroz de ji sala 2013an, yekemîn jimar ji kovara Welat derket, û guleke din li baxê rojnamegeriya kurdî zêde kir.

Bi vê boneyê desteya sernivîser û hemû xebatkarên kovara Welat heştemîn salvegera derçûna kovarê li xwînerên xwe, li rojnamegeriya kurdî û li tevahiya gelê kurd pîroz dikin.

Li ser dirêjahiya heft salên borî ji temenê kovara Welat, berdewam em di nava hewldanê de bûn da ku em belavokekê ku bi mijar û naveroka xwe dewlemend û hemereng be, em wê têxin nav destên xwînerên xwe. Her wiha me hewil dida ku em êş, kul û derdên gelê xwe jî bişopînin, pirsgirêkên wan ên civakî, aborî û jiyânî li ser rûpelên kovara xwe raxînin û roniyê bidin ser wan.

Kovara Welat xwedan taybetmendiyeke ciyawaz e, ew taybetmendî ji mijarên wê yên cihêreng tê. Li kêleka mijarên çandeyî û hunerî, kovarê gav bi gav û qonax bi qonax rewşa deverên rojavayê Kurdistanê û bakur û rojhilatê Sûriye dişopand û guhdaneke taybet bi mijarên (mafê mirov, hevjiyana aştîyane, doza jinê û zarokan, rewşa penaberan û mijarên bîrwerîyê) dikir.

Di heman demê de jî, kovara welat rê li ber bijardeyek ji nivîserên ciwan vekir da ku nerînên xwe derbarê dozên çandeyî, civakî, aborî û wekî din derbirînin. her wiha kovara Welat dikarîbû

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya


giringtirîn çalakiyên çandeyî û hunerî û çalakiyên civaka sivil li deverên rêveberiya xweser bişopîne.

Di dema ku tê de kovara Welat mûma xwe ya heştemîn vêdixe, desteya sernivîser spasiya hemû nivîserên ku bi pênûsên xwe kovara Welat xemiland û dewlemed kir dike, her wiha banga xwe digihîne hemû nivîseran da ku bi nivîsên xwe vê gulê av bidin û geş bikin.

Wekî desteya sernivîser ya kovara Welat herdem em çavdêr û bendewarê dîtin, nêrîn û rexneyên xwîner û şopînerên kovarê ne da ku em sûdê ji wan werbigirin û kar û xebata xwe hîn zêdetir li pêş bixin.

Hêvî, omîd û armanca me ew e ku kovara Welat bi dilê hemû xwîner û şopînerên wê be, û bi rola xwe ya pîroz wekî ku jê tê xwestin ve rabe. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



DAHÊNERÊ ROBOTÊ YÊ KURD

Amadekirin : Kovara Welat

Wergerandin: Imran Yûsiv

Gelo damezînerê şoreşa pîşesazîyê ya Ewropî û dahênerê yekemîn robot di dîrokê de, kî ye?

Kî ye ew kesê kurd yê ku ji berî 800 salî ve bi dahênanên xwe sirûş da cîhanê, û di serî de dahênana yekemîn robot ku mirovahiyê naskiriyê bû?

Ew Bedî-Izeman Ebûl'iz e, ku navê wî yê rast Ebûbekr kurê Rezazê Cizrî ye, û bi koka xwe kurd e. Ew di sala 1136an de Li Cizîra Botanê ya bakurê Kurdistanê ku li qiraxa çemê Diclâyê dikeve ji dayik bûye.

Davênsî bi zanista Mîkanîkê ya Cizrî bandor dibe

Cizrî yek ji mezentirîn dahênerên endezyariya mîkanîkê di serdemên

kevn de tê jimartin, ku zemîn li ber derketina zanista mîkanîka nûjen, barhilgir û dînamoyên ku li ser veguhestina tevgerê kar dikin xweş kir. Û gelek zanyarên rojavayî di dema hişyarbûna zûdem de pê bandor bûn, Davênsî jî yek ji wan bû.

Dahênanên Cizrî bi giştî beşdar bûn di derketina serdema alav û pîşesaziyê li Ewropayê, ku bi navê şoreşa pîşesazî hatiye naskirin.

Di dema dewleta Eyûbî de, desthilatdarên Amedê ew nêzîkî xwe kir, heya ku gihişte pileya serokê endezyarên koçkê.

Cizrî yekemîn nemûne ji matorê buxarê afirand û rê li pêş şoreşa pîşesazî ya nûjen xweş kir.

Berztirîn nexş û dahênanên wî:

Yekem: Alavên hildana avê.

Ji ber ku ew li deverên çandiniyê dijiya, Cizrî bi pêşxistina alavên çandiniyê û barhilgirên avê mijûl bû, hizirên wî yên girêdayî mîkanîkê ji vir hatin. Dêmek di destpêkê de gelek alavên ku girêdayî hildana avê bûn, an jî demjimêrên avî yên xwedan sîstema haydariya xweser bûn nexşandin. Û rabû ew dane xuyakirin û pêkanînê, û pênc alavên hilkirina avê ku bi hêza herikîna avê di

robara xwe ya xwezayî de kar dikir afirandin. Ew jî bûn bingeha çêkirina elektrîkê, û şopeke diyar û xuyanî di dîroka çêkirina alavan li cîhanê de çêkir. Dêmek nemûneya yekem rê li ber afirandina matorê buxarê û alavên avberdana bi mengeneyan an lûleyên di hundirê hev de xweş kir. Her wiha afirandina stûna bi biçik (stûna kereng) vedigere wî. ku ew jî stûna ku bi fişara mengeneyên mator digere ye, vêga hêzeke dehbandina bi pêş de çêdike, wekî ku di matorê tirimpêlê de çêdibe.

Hizira afirandina naûran

Wekî dahênana makîneya bi du lûleyên ku li hember hev in, ku di dema me ya niha de ew beramberî makîneyên mijandin û mengeneyê ye. naûrên hilkirina avê bi rêya sûdegirtina ji tîna peydabûyî ji pêla herikîna avê di çeman de kar dikin çêkin. Piştî alavên xwedan tevgera xweser ku bi avê kar dikin wekî demjimêrên avî, û çend alavên hîdrolîkî yên ku bi dehbandina bi tiştên ruhî kar dikin, afirandin.

Têgîna tînê guhert, û ji bikaranîna lawiran ber bi bikaranîna alavê ve çû.

Cizrî têgîna tînê, guhestinê û tevgerê guhert, ji hêla piştbestina bi lawir û dewaran ji bo guhestin û hilkirina avê, wî berî da bikaranîna alav û mirtalan, ev jî di dîroka zanîtê de veguhestineke nehêsan bû, her wiha Cizrî wesfa alavên fişardanê, hilkirinê, veguhestinê, tevgerînê û taybetmendiyên hemîyan da.

Em dibînin ku mirtalên qutkirinê berî wî nehatibûn naskirin, û ew di demjimêran de nehatin xuyakirin heya piştî dema wî bi du sed salî ku êdî li Ewropayê bi demjimêra Ciyovanî ya asmanî hate naskirin.

Yekemîn kes bû ku demjimêra du destik ya ku demê destnîşan dike çêkir, û demjimêra nûjen ji wê hatye birin.

Duyem: çend demjimêrên ku xwedan sîstema haydariya xweser bûn afirandin û li pêş xistin. Wek demjimêrên avê û yê qûmê, û demjimêrên ku bi fitîlên findan tevdigeriyan. Her wiha hûrbîntirîn demjimêra mûmî di dîrokê de ku ji bo pîvana dema ku karek dixwe tê bikaranîn afirand. Û ew yekemîn kes bû ku demjimêrên du destik ên ku demê destnîşan dikin çêkiriye û

demjimêra nûjen jê hatiye.

Hemerengiyek di afirandina demjimêran de çêkir, û bi reng û şeweyên balkêş ve girêdan. Wek demjimêra fil, demjimêra meymûn, demjimêra daholvan û xeynî wan jî.

Sêyem: Cizrî gelek nafûre ji bo baxçeyên koçkan di dema xwe de afirandin. Her wiha matorek, hilgirek, makîneyek, alavên pîvanê û alavên mûzîkê jî çêkin. Çeydanek jî çêkir ku qepaxa wî nola firindeyekî bû, wî kêliyê difikand berî ku av jê dakeve.

Cizrî yekemîn robot di dîrokê de afirand, ew jî bi riya listikekê ku mîna komeke mûzîkê bû.

Di warê mirovê alavî (Robot) de, yekemîn nemûneya destpêkî ji listikên ku berê hatine programkirin bi rengê mirovekî xwedî tevgerê xweser çêkir. Wekî mînak komeke mûzîkê ku bi ser avê diket, ew kom ji çend kesan pêk dihat û her kesek ji wan dengê alaveke mûzîkê ya taybet derdixist. Mebest jê wens, xemrevîn û dilxweşkirina mêvanên koçka mîr ya li bajarê Amedê bû, ku ew bi ser desthilatdariya dewleta Eyûbîyan ve bû.

Robotê zarokekî ku di dema destnimêjê de şeh û destmal pêşkêşî mîr dikir.

Her wiha Cizrî mirovekî alavî bi rengê zarokekî afirand ku di dema destnimêjê de av, şeh û destmal dida destê mîr.

Cizrî xizmetkareke alavî afirand.

Di warê tenduristiyê de, Cizrî alavek ji bo derçûna avê ji destşok û serşokan afirand. Vêga hewzek ji bo şuştina dest afirand. Li kêleka hewz alavek bi rengê xizmetkarekê çêkir. Dêmek hewz tije ava paqij bû, û gava ku mirov destên xwe tê de dişuşt û xelas dikir, destikek li kêleka hewz hebû dikişand, vêga ew ava ku hatibû bikaranîn ji hewz derdiket û bi rêya boriyeke valakirinê diherikî derveyî hewz, û bi vî awayî hewz ji ava gemarî vala dibû. Alava xizmetkar jî hewz bi ava paqij ji nû ve dadigirt. Ev mîkanîzîm di serşokên me yê îronî de tête bikaranîn.

Pirtûka Cizrî (Civandina navbera zanist û karê sûddar de di çêkirina fêlan de)

Cizrî hemû dahênanên xwe yê navborî di pirtûka xwe ya navdar (Civandina navbera zanist û karê sûddar de di çêkirina fêlan de) de ku di sala 1206an de nivîsiye civandin. Dêmek bêjeya Fêlê li şûna bêjeya Mîkanîkê ya yûnanî hatiye bikaranînê. Mirov bi rêya fêlbaziyê dixwaze hemû tiştan û têkiliyên navbera wan ji bo veguhestina tevgerê, peydakirina tînê û rabûna bi gelek karan di demeke kurtir de û bi kêmtirîn şiyar bikarbîne.

Danîna vê pirtûkê bîst û pênc sal ji xwendin û lêkolanê pê re xwar. Vêga bi rastî ew weke rêbereke zanistî ye ku di pênc beşan de li ser alavên mîkanîkî û hedrolîkî diaxive. Cizrî yê ku Xwedê evqas nîgaşa fireh dabûyê, didît ku zanista fêlbaziyê divê xizmeta mirovan bike, û nebe tenê wens, lîsk û xemrevînî.

Perra Cizrî ya nemir.

Nexş û nîgarên Cizrî heya roja me ya îroj bedew û xweşik mane. Ew hişekî behremend û afrîner dinimînin. Wî hemû dahênanên xwe bi hûrbînî û bi rêya nexş û nîgarên qeşeng, ciwan û dîlkêş di pirtûka xwe de şirove kirine.

Cîhan hê jî pirtûkên Cizrî û qenciya wî hiltînin.

Di çarêka pêşîn ji sedsaliya bîstan de, (Fîdman) û (Hawser) hin beş ji pirtûka Cizrî ji bo zimanê elemanî wergerandine, her wiha pisporê dîroka teknelojîyaya erebî (Donald Hîl) ji bo zimanê inglîzî jî wergernadiye.

Hin destnivîs ji pirtûka wî li mozexana Kabî (albab alalî) li Stembolê û li mozexana hunerên ciwan li Bostunê, û li mozexana Loverê li Ferensayê, û li pirtûkxaneyê Oksfordê ya Birîtanyayê hene.

Cizrî li bajarekî ku gelek navdarên kurd hambêz kirine, ji bo axê hate spartin.

Ev zanyarê kurd di sala 1210an de koça dawî kir, û li bajarê kurdistanî yê dîrokî (Cezîra Botanê) hate veşartin, ku ew bajar merqeda xwediyê navdartirîn çîroka evîndariya kurdî



(Mem û Zîn) û navdartirîn helbestvanê kurd Melayê Cezîrî ye.

Cizrî ji hêla kes û karên xwe ve hatiye jibîrkirin.

Di dema ku tê de ereb û tirk dixwazin nasnameya wî ya netewî bidin guhertin û wê nasnemeyê li xwe bigirin, li bajarên kurdî heya bi peykerekî wî jî tineye.

Vêga çendî pêdiviya me pê heye ku peykerekî Cizrî li bajarên me yê kurdî bête çêkirin, da ku em zanyarên xwe yê pêşîn ên ku xizmeta şaristaniya cîhanê û mirovahiyê kirine bi bîr bînin. Da ku nîfşên me yê nû bidin ser şopa wan. dêmek çand û zanîn ew in rêya ku kurd pê mafên xwe yê rewa bidest bixin e. ■

هل نحن امام تحديٍّ أخطر من الفيروسات



بقلم آهين علي

وهل فيروس الانتحار اخطر من فيروس كورونا ؟

تعددت الوسائل والنتيجة واحدة فما هو الانتحار ؟

وما هي الاسباب الكامنة وراء تفشي هذا الوباء في مناطقنا

اسئلة

هامة سوف احاول الاجابة عليها خلال سياق هذا المقال ففي السنوات الاخيرة مع بداية الازمة السورية في آذار 2011 ظهرت الكثير من الظواهر الخطيرة التي ما لبست ان تلاشت الى حيز الوجود تدريجياً لتشكّل خطراً اجتماعياً كبيراً امتدت آثارها على الفرد والأسرة والمجتمع عموماً ، ظواهر يمكن ان نعدّها اوبئة اجتماعية فتاكة عانت وماتزال تعاني منها معظم المجتمعات وخاصة الأوروبية ولعل ظاهرة الانتحار تنصدر تلك الظواهر وهو انهاء الشخص لحياته عمداً ، ويشكّل الانتحار عاشر الاسباب الرئيسية للوفاة في العالم حيث يموت ما بين 800 الف إلى مليون شخص سنوياً عن طريق الانتحار حسب الاحصائيات الاخيرة لمنظمة الصحة العالمية ناهيك عن اضعاف هذا الاعداد من الذين يحاولون الانتحار وغالبية حالات الانتحار المسجلة تكون بين النساء والشباب حيث شكّل الانتحار ثاني سبب للوفيات بين الفئة العمرية 15 - 29 عاماً على الصعيد العالمي فهي أي الانتحار ظاهرة عالمية وليست حكراً في بلاد معينة وهذا ما زاد من خطورتها

ويرى اطباء وعلماء النفس ان الاضطرابات النفسية "الاكتئاب - اليأس - فقدان الرغبة في الحياة - عدم القدرة على التعامل مع المشاكل - الانفعال المفرط " اضافة الاعتداء الجسدي والجنسي وتعاطي المخدرات ولعب القمار والفقر ووسائل الاعلام والنزاعات والحروب والهجوم الانتحاري وهو عمل سياسي يعتبره الانتحاري تنفيذاً للواجب من اجل قضية سامية أو التزام أخلاقي أهم اسباب الانتحار .

وبالعودة الى الشأن المحلي وحالات الانتحار التي تجاوزت العشرات خلال الاشهر القليلة المنصرمة في مدن محافظة الحسكة ناهيك عن عشرات المحاولات التي باءت بالفشل والتي غالبيتها من الفئة العمرية بين 15 - 35 عاماً فهل نستطيع ارجاء السبب

الى الحرب والنزاع الدائر في سوريا التي ادت الى تدهور الحالة الاقتصادية وازدياد ملحوظ وكبير في المشاكل الاجتماعية كازدياد حالات الطلاق والتفكك الاسري وانعدام اللفة ضمن الاسرة الواحدة إضافة الى الضغوط التي يمارسها الاهل على الاطفال والمراهقين لاحراز التفوق في نواح عدة سواء منها الدراسية او الثقافية او الفنية وحتى الرياضية .

ولا ننسى الوضع السياسي المخيب و موجات اللجوء والنزوح وتأثيرها الكبير على الفرد والأسرة والمجتمع والازدياد الملفت لأعداد المنتحرين في مخيمات النزوح وبلاد اللجوء وخاصة بين النساء كون المرأة أكثر تعرضاً للضغط النفسي والاعتداء الجسدي والجنسي مقارنة مع الرجل وتشرد افراد الاسرة الواحدة بين عدة دول ولا سيما رب الاسرة حيث غياب التربية الاسرية الايجابية وتثقل كاهل المرأة من حيث قيامها بدور الاب والام معاً

ولا يمكن اغفال مسألة انتشار السلاح الذي كان اقتنائه حكراً على فئة معينة في السابق وتوفره اليوم في كل بيت وفي متناول ايدي الجميع ولا سيما الاطفال والمراهقين الذي يعتبر من وسائل الانتحار الرئيسية بعد الشنق وتناول السموم والمبيدات الحشرية والقفز من الاماكن المرتفعة

ولربما يمكننا ربط هذه الحالات بالتطور التكنولوجي حيث من المعلوم لدينا بان هذه الفئة العمرية اكثر الفئات تأثراً وقاساً مع التطور التكنولوجي و وسائل التواصل الاجتماعي وخاصة الاخيرة أي وسائل التواصل الاجتماعي وما يترتب عليها من جرائم الابتزاز الالكتروني ناهيك عن الاستعمال السيء للتكنولوجيا ومتابعة الاطفال والمراهقين لبرامج والعب تروج لثقافة العنف والانتحار والقتل ولاحظنا ذلك في الآونة الاخيرة مع ظهور لعبة مريم الالكترونية والتي راح ضحيتها العشرات من الاطفال بمحاولات جادة للانتحار

ولربما كانت عدوى الانتحار التي تلعب وسائل الاعلام الدور الرئيسي فيها هي اقوى الاسباب التي ادت الى تفشي ظاهرة الانتحار في منطقتنا وهذا ما استنتجته من التتالي غير المسبوق في حالات الانتحار لدينا ووسائل الاعلام التي تفتقد الى المهنية في التعامل مع هذه الظواهر وتغطيتها من جوانب معينة ربما يكون لها اثر كبير على هذه العدوى حيث اثبتت الدراسات ان التغطية الاعلامية تؤثر بمعدل يتراوح بين 1 - 2 % في معدلات الانتحار عندما يربط المرء نفسه ببطل قصة الانتحار فانه ربما يسير في الطريق ذاته ■

SIBIHA ŞEHÎDEKÎ



Zahid Mihemûd Xelef

Keda her şehîdekî di çavên axê de bi kulîlkan hatiye xemilandin. hîn xwêdan ji çeka wî ziha nebûye, berhema westana wî hema neyar liber veketine, ji sosret û qephetên zikreşan, peravên rokê divemirin, şerm wan diguvêşe, cobarên hêşiran lehî û golên tije ava nexweşiyê ne thelin, dise, û di hembêza heman axê de, tilîyên şehîdekî dî jî hildikişin bi ber jorêve ,berdewamê sozêne, volqanin,sitranan dilorînin,serşorî xwe vedişêre.

Waye bandike tilî xuyane : Hava ye jiwere ev e guleya dawî ye, ji were bigihînin hevparê çepera min ê ku li şûna min dimîne ,li ber xwe dide, bere tu kes ne bêje, mirin, lê ew serhişkin, mêrin hebûna wan her dimîne, Kurdin ji mirinê jiyane çêdikin, tilîlî û navtêdan şanê Kurdane.

Berê sibihê bû Rok ji nûve di hilat, derdiket ,Egîd hêdî hêdî, rahişt çekê xwe da ku li bejna xwe bipêçkê ,wê herê, Erikê parastina çepera rûmeta xwe,ew tenê çend se'etbûn hatibû malê şevê dî Hevjîn û keça xwe hembêzkiribûn bêrîkirinê dilê wî tije kiribû, Erê ew şervan e çavdêrê penav û dadmendiya doza xwe ye ,lê keça wî Rewşen pê dihişiya ,dema ku pêlawa xwe dixist lingê xwe , bandikir:

Yabo tê çi bikê ,tê herê ,de ka hinekî dî li cem me bimîne taştê bi mere bixwe me pir bêriya te kiriye, diyamin digot ev e du mihin tu dûrî me ye,

Egîd di cihê xwe de ma cemidî, ne ma di zanîbû bersiva keça xwe bidê,lê care tune ye ,

Keça minî delal: divê ez herim hevalê min li hêviya minin karê me heye, ezê rojeke dî werim.



Rewşen : erê yabo ez dizanim tê biçê şer ,wê rojê pîrika min gote diyamin ez çiqasî li ser Egîd ditirsihin ,xwedê mala dijminan wêran bikê

Egîd:keça min guh ne de van tiştê ,tenê bixwîn e da ku tu bi serbikevê û ez bi te serbilindbim

Rewşen:yabo ha wê rojê bavê lewendo anîn ku ew şehîd e ew gelekî giriya ,ma ne şehîd diçin e cinetê ku em mezin bibin em jî diçin cem wan

Egîd :keça minî delal ez pir ji we hezdikim ,tenê ku tu bixwîn e , ezê kêfxweşbim ,ka maçeke xweş bide min ,ezê herim,da ku Dereng ne mînim, divabê mirov Soza xwe ji bîr nekê em kurê vê axêne û em ê li ser bijîn,û bi.....rin jî

Egîd cemedana xwe li sukra xwe pêça û derî li dûv xwe girt lê kesereke kûr û dirêj di sînga wî de fûriya,zor e mirov li ser xaka xwe xerîb bibînê

Em nema vedigerin wan dema, ji bo we keça min em ê berdewam bikin ■

تتمة المقال: البارحة كنا في اليوم الثاني عشر

لطف الله بقلبي حين كان عمرك ثلاثة أشهر

حين امتنعت عن وضعك بين يدي مجنونة في القرية التي
كان والدك معلماً فيها حيث كنت أراقبها كيف تضع قطعة
الخبز في فم عنزة ثم تأكل الباقي وبعد محاولاتها الكثيرة
سألت نساء القرية عن السبب فأخبروني لاتفعلوها لأنها لن
تترك الصغيرة الا بعد قتلها فهي المجنونة بسبب عقدة الفقد

وكثيراً ما قلت لأمي ليتك تركتها تقبلني وكلي يقين بأنها
كانت ستعيديني إليك.

فتضحك أُمي وتقول

وما دليلك ؟

أرد بثقة بأن قلوبهم مليئة بأشياء جميلة لا يدركها الكثيرون
ثم هل نسيت الخبز والعنزة. ثم أضحك و بجنون..

هل أنا مجنونة؟؟

أنا كثيراً ما تمنيت أن أكون مجنونة جميلة لذلك دخلت عالم الشعر منذ الصغر.

تعالوا تبحث عن الحياة، عن الإنسانية عن النقاء في زمن البترودولار و هيمنة الاتصالات على عقول البشر.

تعالوا نبحث عن أولئك الذين يفتقدونهم ذاك «المجنون» بيتا بيتا، شارعاً شارعاً... مجانين كثر حكموا هذه الأرض..مجانين
كثر أوصلتهم عبقريتهم إلى الصفاء.

إلى أين يغادرنا كوكب الأرض.

أسألكم؟

و على هذي الأرض ما يستحق الحياة..

الدرويش.. المتخم بالجنون.. الراحل في حضرة الغياب قالها.

ونحن نستحق الحياة أقولها.....

كونوا بخير أصدقائي المجانين. ■

البارحة كنا في اليوم الثاني عشر

نجا من وباء ما في مدينة ما . رجل وحيد يعود هو وزوجته ليقوما في مدينة لا أحد فيها، بكل بيوتها و «عفشها» و بكل الأموال و المصوغات...سيد المدينة الخالية دون منازع، ماذا يمكن للانسان أن يمارس من سلطة على مدينة لا بشر فيها... المطارات مغلقة، السماء مغلقة، و البحر أيضا و الطرق و القطارات و المشافي و دور التعليم،... إزاء هكذا سيناريو... أسود قاتم ماذا عساه ذاك المجنون تحت شرفة بيتي أن يقول...



فيروز رشك

(لقد مضوا جميعا... كش زي فر جون.. هكذا كان يخاطب الطريق.. يخاطب جدران البيوت... الكل قد غادروا من هنا.. هكذا كان يحدث روحه و هو ينظر في أبواب البنايات... جملة هذه.. أيقظت بعضا من جنوني، ماذا سيكون مصير المدينة لو حكمها هذا «المجنون».. ألم يحكمها العقلاء من قبل، فهاهي النتيجة... عالم يتجه نحو تخوم الجنون.. ماذا دهى ذاك الرجل؟..

أهي عبقرية الجنون... أم جنون عبقريته...؟!.. هل العالم بحاجة لعبقرية الجنون ام إلى جنون العبقرية... لا أريد لأحد أن يعتمد علي في الإجابة...

ربما الجواب يكمن في العبارة الأذلية... (خذوا الحكمة من أفواه المجانين) أنا فكرت في طفولته وحين تقوم القيامة هل سيعتذر الله منه كما علمنا رجال الدين هل فقد عقله بسبب ألم ما أو حب ما أو غف ما .

هل يشعر بهذه الحرب ولماذا يبكي ويضحك في آن واحد . لماذا نهرب من الخطر وهو لا يأبى . لماذا يمزق ثيابه ويرفض القيود؟

ربما كان الجنون شيئا جميلا لا يشعر به الآخرون . كثيرا ماوددت التقرب إليهم .

لماذا نحسب أنهم لا يشعرون بالبرد أو الحب والعطف ونخافهم

أمي تقول دائما ...

أعتذر

بشدة اليوم هو الثالث عشر من الحظر

لم يعد للزمن قيمة، الأوقات كلها تشير إلى الكورونا تماما بتوقيت روزنامتي الأنيقة...

جرعة التوحد تزداد، و نشرات الاخبار تحمل مزيدا من الذعر اليومي، و ربما هي انتهاء فترة الصدمة، و بداية التحول نحو المواجهة الفعلية مع الذات...

ماذا لو استمر هذا الفايروس العولمي و ان كان الحجر حلاً (بالتأكيد مؤقتا) فإلى أي مدى زمني يمكن للانسان أن يبقى رهين جدران بيته، يراقب ما يحدث من بلاء و تدمير للبشرية، هل ستبقى طواقم الإعلام مستمرة و الى أي درجة يمكنها الثبات، مراسلين و معدين و مصورين و تقنيين، هل ستلزم هي الأخرى «بالحجر الاعلامي» من ذا الذي سيبقى في المختبرات، و أي معامل ستنتج العقار المنقذ في ظل حجر كل البشر خلف نوافذهم التي تطل على مساحات خالية من البشر، و شوارع انتهت فيها حركة السير و المواصلات، ، ثم إلى أي وقت زمني يمكنها الأسر و التجمعات السكنية من العيش في ظل نفوذ مواد الشرب و الغذاء و المحروقات، ، و الى أين ستتجه ملايين قطعان الماشية و الدواجن دون رعاية، و ما مصير الضحايا، من ذا الذي سيدفنهم، و ماذا بالنسبة لروائح الجثث.

هل أنا مجنونة لأتحدث عن كل هذا !

أتذكر رواية لسيد الرواية العربية نجيب محفوظ، رواية عاشور الناجي، حكاية ذلك الرجل المسكين الوحيد الذي

ELÎ HERÎRÎ [1010 - 1078]

Helbestvan û fêlezofê kurd Elîyê Herîrî li gundê Herîrê yê bi ser devera Şemzînana bakurê Kurdistanê ve ye di sala 1009an de ji dayik bûye.

Kurdnasê Rûsî Aleksander Caba dibêje ku Herîrî helbestvanê kurd yê pêşîn e ku helbest bi zimanê kurdî nivîsiye.

Herîrî, dema ku hîn ciwanekî nûhatî bû, ew bi zanebûn û aqilmendiyê hatibû naskirin. Di wê qonaxê de wekî Seydayekî bi sedan zarok fêr dikirin.


Bavê Elî kesayeteke zana bû, û li devera xwe cihekî girîng, bilind û bi bandor digirt. Lewra xwest ku kurê xwe bişîne Cezîra Botanê da ku zanist û zanîne li wir werbigire, çimkî Cezîra Botan di wê demê de navenda zanîne, û menareya ronakbîriyê bû, û hemû zana û fêlezofên kurd û deverê lê dicivyan.

Li gorî hin jêderan, dema ku Elî di destpêka ciwaniya xwe de bû, bavê wî koça xwe ya dawî kir, lewra wî şûna wî girt.

Herîrî demeke dirêj li Cizîra Bota dimîne, piştîre diçe Şamê. Çimkî di wê demê de dewleta Merwanî ya kurdî li dar bû û sînore wê digihîşt heya bi Libnanê.

Herîrî di temenekî pir biçûk de dest bi nivîsîn û afirandinê dike, dema ku zana û şerezayên Bexdayê nivîsên Herîrî dixwînin pir li wan matmayî dimînin û bawer nakin ku ciwanekî nûhatî ewqas xweş nivîsiye, lê dema wî didin ber ezmûnê, ji afrîneriya wî piştrast dibin û bawer dikin.

Herîrî bi zimanxweşî û rewanbêjiya xwe



Ali Hariri

علی حریری

dihate naskirin, lewre ew bibû mînaka mirovê zimanxweş û rewanbêj. Û dema ku kesekê-î gotineke pir xweşik û bi zanebûn digot jê re digot (Te herîriyek kir).

Li gorî hin jêderan, Herîrî bandora xwe li hemû zana, şarezar û aqildarên dema xwe kiriye, navûdengê wî sînore Kurdistanê derbas kiriye û li hemû deverên dewleta xilafeta islamî belav bûye, heya radêya ku wî bandor li xelîfeya misilmanan bixwe jî kiriye.

Hin jêder dibêjin ku gelk helbest û pirtûk nivîsîne û berhemên pir bûn, lê mixabin ew berhem tevde wenda bûne û negihîştine nav destên me.

Helbestvan û fêlezofê kurd Elî Herîrê di sala 1078an de koça dawî dike, û li gorî ku tê gotin, ew li gundê xwe Herîrê ji bo axê tê spartin. ■

FERHENGOK

Bextewerî- dilşadî	سعادة
Evîndarî- hezkirin	محبة
heyecan	حماسة
Xemgînî	حزن
Dilbijîn	اشتهاء
Westîn	تعب
Kêf-şahî-şadî	فرح
Xemrevînî	تسلية
Geşbînî	تفاؤل
Reşbînî	تشاؤم
şanazî	فخر
Hêvî	أمل
handan	تشجيع
hêrs	غضب
bêrî	حنين
Mixabinî	أسف
hest	شعور
Mat	تعجب
Dudilî	تردد
pelmişîn	تطفل



ROJA CÎHANÎ YA ZIMANÊ DAYÎKÊ



Nêçîrvan Evdilezîz

Pirrengîya çand û zimanan li cîhanê dîyardeyeka sirûştî ye. Çimkî her civak li gor derdor û jîngeha xwe zimanê xwe bi pêş xistiye. Rêwîtîya bipêşketina ziman di gelek çax û demsalan ra derbas bûye. Ji zimanê jest û mîmîkan dest pê kiriye, piştra gihaştîye qonaxa deng û qîran, dawî jî bi domana demê ra ev deng li zimanekê fambar veguhezîne ku her civak bûye xwedî zimanekê taybet.

Zimanê Dayîkê

Zimanê dayîkê ew ziman e ku mirov ji dema jidayîkbûna xwe ve hînî wî dibe û pê dipeyve. Zimanê mirov yê yekem, giştî û sereke ye. Lewra mirov pir bi hêsanî bi zimanê xwe yê dayîkê diaxive û hest û ramanên xwe derdibirîne. Zimanê dayîkê bi xwe weke dayîkê şîrîn e. Ji bo ku mirov tişta di dil û hişê xwe de derêxe, zimanê dayîkê nola dayîka ku alîkarîya zaroka xwe dike, alîkarîya mirov bi peyv, gotin û hevokên lihevhatî dike. Her çiqas yek jê dûr bikeve û rajeya wî neke, lê dema ku lê vedigere, mîna dayîka ku kurê xwe hembêz dike, zimanê dayîkê mirov vedihevine. Zimannas ji bo zimanê dayîkê sembola “L₁” û ji bo zimanê din yê ku mirov hînî wî dibe «L₂» bi kar dihînin.

Çima 21ê Sibatê wekî Roja Cîhanî ya Zimanê Dayîkê hatiye binavkirin?

Li rojhilatê Pakistanê (Bengladeşa niha) piştî spandina zimanê «ûrdû» ku tenê zimanê dayîkê yê 3-4% ji nişteciyan bû, xwendekarên bengalî ku zimanê bengalî zimanê zêdeyî 50% ji nişteciyan bû, li Zanîngeha “Dakka”yê di 21.2.1952 da li dij vê biryarê derketin xwepêşandanan. Di encama vemirandina xwepêşandanê da nêzî 13 xwendekarî jîyana xwe ji dest da. Lewra ji sala 1999an ve her sal roja 21ê Sibatê wekî “Roja Cîhanî ya Zimanê Dayîkê” tê pîrozkirin. Vê rojê Unescoyê tevgera xwendevanên bengalî ya di rêya azadîya ziman da, wekî rojeka giring ragihand. Herweha bi saya vê hişmendîyê sala 1971ê dewelta Bengladişê ya serbixwe ava bû.

Girîngîya zimanê dayîkê

“Heger hûn bixwazin baş zimanekê nû hîn bibin, pêşî guh bidin zimanê xwe yê dayîkê». Civaknas û karzanên perwerdeyê amajeyê bi wê yekê dîkin ku perwerdekirina zarokan bi zimanekê bîyanî, bandoreka neyînî li wan dike. Lê perwerdeya bi zimanê dayîkê dikare alîkarîya wan di avakirina bingehekê akadêmîk da bike, herweha egera biserkeftina wan di xwendin û karê paşerojê da zêdetir dibe. Çimkî encamên lêkolînên hemû lêkolanan di vê babetê da girîngîya hînbûna zarokê bi zimanê dayîkê ji destpêkê ve berî ku dest bi fêrbûna zimanekê din bike, dîyar dîkin. Ji ber vê yekê li dewletên bipêşketî, dibistan derfeta fêrbûna bi zimanê dayîkê ji xwendekarên penaber ra vedikin.

Li alîyekê din bipêşketina zanîn û hizirandinê li nik kesên ku zimanê dayîkê dinasin, ji kesên ku nanasin bileztir e û şarezayî û jihatîyên xwendin û nivîsînê jî li cem wan lipêş in. Herweha zanîna zimanê



dayîkê cihê şahnazî û serbilindîyê ye û bawerîya mirov bi kesayeta wî geştir dike. Mirov bi çand û kokên xwe ve girêdayî dihêle.

Çima ziman qir dibin yan jî dimirin?

Wexta axêverê dawîn yê zimanekî jîyana xwe ji dest bide, bi vî awayî ew ziman jî dimire. Bi sedema globalîzasyonê dibe ku nêzî 43% ji 6 000 zimanên ku li cîhanê likar in, bi temamî qir bibin. Windabûna van zimanan dihê wateya windabûna cihêrengîya çandî û tevna cîhanê ya dewlemend. Li gor Unescoyê bi hatina sala 2050 yê, derdora 3 000 zimanî di bin metirsîya jîholêrabûnê da ne. Her du hefteyan zimanek bi paşmaya xwe ya çandî û hizirî ve ji nav diçe. Zimanên ku di hînkari û perwerdeyê da nehên bikaranîn, yan di jîyana civakî û karûbarên fermî da ne azad bin, bê guman di bin metirsiya nemanê da ne. Vêca gelo sedemên qirbûna zimanan çi ne?

Bi giştî sedem ev in:

1. Sedemên sîyasî û çandî

Çewisandina çandî li dij gelekî ji hêla desthilata sîyasî ve ku zimanê wî gelî armanc digire. Di encama vê gavê da

zimanê dayîkê yê gelek milletên bindest ji
holê rabûye.

2. Sedemên aboriyî

Ji bo bidestxistina karekî û debara jîyanê, malbat zarokên xwe fêrî zimanekê din dikin. Ji bo ku (li gor wan) paşrojekê baş ji zarokên wan ra peyda bibe.

3. Bobelatên xwezayî

Bi sedema bobelatên xwezayî gelek mirov jîyana xwe ji dest didin. Di 2004an da 230 000 kes di encama wan kersetan da mirin. Mirina bireka mezin ji niştêcîyên devereke, rê li ber nemana zimanê wan vedike.

4. Koçberî

Koçberî roleka mezin di guherîna zimanan
û mirina wan da dilîze.

“Dema tu bi mirovekî ra bi zimanekî nas dike yan fêhm dike, diaxivî, gotinên te diçin hiş û serê wî. Lê çaxa tu bi zimanê wî yê dayîkê biaxivî, gotinên te rast xwe berdidin dilê wî”

Nelson Mandela



Meha Remezanê û Krîza Buhabûnê

Efsan Kurdî

bi hatina meha remezanê re nîrxê pêdiviyên jiyanê li bazara amûdê bilind bûne, xelk jî nerazîbûna xwe derbarê vê yekê nîşan didin û lomê û gazinan li desteya temwînê dikin û dibêjin ku ew baş bi erkê xwe ranabin. Her wiha gazinê ji keysbaziya bazirganan dikin ku ew vê mehê weke derfetekê ji xwe re dibînin ku li ser milê welatîyan qezenciyan xwe zêde bikin.

Ev Bilindbûna nîrxê madeyên xwarinê tê di demekê de ku rewşa xelkê ya aborî pir xerab e, ew jî ji ber bilindbûna nîrxê dolar li hemberî leyreya sûrî ye. Ji aliyekî din ve qedexeya çûn û hatinê ku ji hêla rêveberiya xweser hatiye cîbicîkirin ji bo paraştina ji vîrûsa koronayê bû sedema girtina rêyên çûn û hatinê di navbera dever û bajaran de, vê yekê jî beşdarî kir di kêmpêydabûna pêdiviyên bazarê, lewra nîrxê hemû kel û pelan û şînkahiyê bilind bûye.


Ji ber vî hawî, niha welatî xema peydakirinê pêdiviyên Remezanê

dixwin, çimkî her kes dizane ku di rewşa qedexeya hatûçûnê de

kar peyda nabe û ew nikarin pêdiviyên jiyanê xwe bi dest bixin, bi sedan welatî hene ku û debebara jiyanê wan girêdayî karê wan yê rojane ye û ev demeke ku ji ber tedbîrên xweparaştina ji koronayê ev kar rawestîye.

Piştî derdora heyvekê ji qedexeya hat û çûnê, rêveberiya xweser biryar da ku ewê alîkariya malbatên hewcedar û kesên karkir bikin, ew jî bi pêşkêşkirina selikên xwarinê. Lê tevî belavkirin hin selikên xwarinê xelk carek din nerazîbûna xwe ji şeweyê belavkirina van selikan nîşan dan û gotina ku ew selik bêtir digihêjin kesên tîr û nagihêjin feqîr û hejaran.

Fehed Mihemed ku ew welatîyek ji bajarê Amûdê



ye ji kovara welat re axivî û got: Em tev dizanin ku dûmkirina krîza Sûrîyê heta dema îro zirarek mezin li abûriya vî welatî kiriye, bi taybet buhabûna nîrxê dolar li himber leyra sûrî. Ev nebes bû bi ser de ev nexweşiya koronayê bi ser me de hat, û qedexeya hatûçûnê li devera me barê me girantir kir, nîrxê pêdiviyên jiyanê pir buha bûye, bi taybet bi hatina meha remezanê re, nîrxê madeyên xwarinê û şînkayî li bazaran pir bilind kirine, wek mînak, îro kesê feqîr û hejar nikare tîr bacan bixwe, ji ber ku

Di berdewamiya axaftina xwe de Fehed dibêje: Berî demekê rêveberiya xweser hin alîkarî belav kirin lê ji sedî negihîşt dehan, îro di vî rewşa nexweşiya koronayê de xelk hemû feqîr û hejar bûne û hewcedarî alîkariyê ne.

Simaîl Hiso dikançiyek ji amûdê ye, ew jî derbarê vî buhabûnê ji kovara Welat re axivî û got: Her sal, bi hatina meha remezanê re nîrxê kel û pelan li bazaran bilind dibe, lê vî carê pir buha bûye. Sedema wê ji bilî bilindbûna nîrxê dolar, ev qedexeya hatûçûnê ye, tedbîrên ku hatin standin ji bo paraştina ji nexweşiya koronayê bû sedema girtina rîyan, vî jî bandor li nîrxê kel û pelan kir. Wekî dikançî ev buhabûn ne ji cem me derdikeve, û em jî pê diêşin. Bazirganên mezin keysebaziyê li xelkê dikin û nîrxên kel û pelen bi kêfa xwe datînin, eger ev bazirgan bixwazin wê bikaribin buhabûnê rakin, em hêvî dikin ku rêveberî bikaribe rî li ber van bazirganên mazin bigire û wan agahdar bike da ku pabendiyê bi daxistina nirxan, û desteya temwînê ya bi ser rêveberiya xweser jî bi erkê xwe rabe û çavdêriya nirxan li bazaran bike. ■

التحضير لموسم الحصاد في ظل الحجر الصحي بسبب كورونا

أفسان كردي

يونس عبدالله صاحب احدي الحصادات بمدينة عامودا تحدث لمجلة ولات عن المعوقات التي يواجهونها خلال عملية اصلاح حصاداتهم و تجهيزها من أجل موسم الحصاد في ظل هذا الحظر الصحي قائلاً : « لقد تأخر معظم أصحاب الحصادات في انجاز عمليات اصلاح حصاداتهم بسبب الحظر وأغلاق معظم المحلات المتعلقة بقطع التبدل ومستلزمات الحصادات» و أضاف عبدالله بأن قرار الادارة الذاتية السماح لأصحاب الحصادات ومحلات القطع غيار بالعمل من الساعة الخامسة مساءً الى الواحدة صباحاً جاء متأخراً و هذه المدة غير كافية من أجل انجاز عملية اصلاح الحصادات كما عبر عن أمل في أن ينتهي هذا الوباء و أن تعود الحياة الى طبيعتها.

ابراهيم ابراهيم أيضا صاحب احدي الحصادات تحدث إلينا قائلاً : «لأشك أن كل اصحاب الحصادات وغيرهم من عامة الناس قد تأثروا بقرار الحظر الصحي فنحن الآن نعمل على اصلاح حصاداتنا، لكننا نعاني من قصر الفترة التي حددتها الادارة الذاتية لمحلات قطع الغيار، فأحياناً نحتاج الى بعض القطع التي لا تتوفر هنا في عامودا فنضطر الى الذهاب الى القامشلي وحسراً بعد الساعة الخامسة لأن المحلات لا تفتح صباحاً لهذا فأصحاب تلك المحلات المفتوحة يقومون باستغلالنا عبر التحكم و التلاعب بأسعار القطع، لقد ارتفعت أسعار قطع الغيار أضعافاً مضاعفة وهناك استغلال و احتكار من قبل التجار الذين يتحججون بارتفاع سعر الدولار وانقطاع الطرق وعدم وصول البضائع لهذا نحن نعاني هذه السنة من صعوبات كبيرة وخاصة تكاليف التصليح.»

مع اقتراب موعد حصاد الموسم الزراعي لهذا العام ، بدأ المزارعون وأصحاب الحصادات في مناطق الادارة الذاتية بصيانة وتجهيز الحصادات والآليات معربين عن أملهم بوفرة الموسم الزراعي بعد الهطولات المطرية الغزيرة.

لكن بسبب الحجر الصحي المفروض للوقاية من فيروس كورونا المستجد من قبل الادارة الذاتية على مناطق شمال شرق سوريا بات أصحاب الحصادات يواجهون مشاكل كبيرة نتيجة تأخرهم في القيام باصلاح حصاداتهم هذه السنة وذلك بسبب أغلاق معظم محلات قطع التبدل ومحلات الصيانة كالحداة والميكانيك وغيرها واغلاق أغلب الطرق ومنع أصحاب الحصادات من المرور عبر الحواجز لتأمين قطع التبدل أو الصيانة.

وبعد عدة شكاوى من قبل أصحاب تلك الحصادات وأصحاب محلات قطع التبدل وبسبب تأخر تصليح حصادات المنطقة وباعتبار أن المنطقة زراعية و يعتمد اقتصادها بشكل أساسي على المحاصيل الزراعية، قامت الادارة الذاتية بأصدار قرار يسمح لأصحاب المحلات الخاصة بقطع التبدل والصيانة بفتح محلاتهم من الساعة الخامسة مساءً الى الواحدة من صباح اليوم التالي وسط اجراءات وقائية. والسماح للسيارات التابعة لأصحاب الحصادات بالمرور عبر الحواجز والتنقل بين المناطق بشرط أن يحملوا رخصة تثبت بأنهم من أصحاب الحصادات.

لكن مع ذلك لايزال أصحاب تلك الحصادات يشكون بأنهم يواجهون عدة مشاكل هذه السنة في أصلح الحصادات .

KURDOLOJÎ ONLINE

Amadekar: Nêçîrvan Rojava



Ji bo ku ev dema karantînayê ya ku vîrûsa Coronayê li ser xelkê cîhanê tevî - kurd jî di nav da - spandiye, bê sûd û vala vala derbas nebe, zimannas û zanayên zimanê kurdî biryara damezirandina zanîngeheka kurdî li ser internetê girt. **Kordolojî Online** zanîngeha kurdî ya pêşîn e ku bi rêya internetê perwerdehiya xwe bi rê ve dibe. Herweha kurdên her çar parçeyên Kurdistanê û yên Ewropayê digihîne hev û projeyeka hevpar di navbera wan da saz dike.

Li gor berpirsê Zanîngehê "**Brahîm Seydo Aydogan**", aramanca sereke ew bû ku ew alîkarîya mamoste û xwendekarên Zanîngeha Rojavayê bikin, lewra wan pêşî hejmara xwendekarn tenê 100 kes destnîşan kiribû ku 60 ji wan ji Rojavayê Kurdistanê bin û 40 kes jî ji deverên din bin. Lê ji ber ku gelek daxwazên tevlîbûnê ji wan ra hatin, wan nedixwest ku çi kurdekî ji vê Zanîngehê bêpar bihêlin, ji ber vê yekê hejmara xwendekaran ji 100î kişande 320 xwendekarî.

Seydo di gotara xwe da weha dibêje: "Ji ber ku birêxistinkirin û avakirina vê bernameya

Zanîngeha Kurdî ya Online barekî giran lê berpirsiyariyeke mezin û dîrokî bû, em gellekî pê re westiyan û mamosteyan hemûyan bi xwebexşî pejirandiye ku milî bide milê me. Em spasdarê wan û keda wan in". Dêmek hemû mamosteyên beşdar bê berdêl kar dikin. Perwerdekarên Zanîngehê di qada wêje û zimannasiyê da xwedî dîrokeka dirêj in û gelek salên imrê xwe li vî zimanî xerç kirine. Li jêr navê mamosteyan li gel biranşa wan dihê rêzkirin:

- Dawid Yeşilmen (Essen): Wêjeya Kurdî ya Modern (sedsala 21)
- Michael Chyet (Washington): Zimannasî û Ferhenga Kurdî
- Hacer Petekkaya (Qamişlo): Zaravayên kurdî, Zazakî û Kurmancî
- Brahîm Seydo Aydogan (Paris): Zimannasîya Kurdî, Metodolojî û lêkolînên zanistî, Wêjeya Kurdî (heta sala 2000)
- Abdilwehab Xalid Mûsa (Dihok): Zimannasî û Fonetîka Kurdî
- Michiel Leezenberg



(Amsterdam): Wêjeya Klasîk, Mîtolojî û felsefe

- Jan Îlhan Kizilhan (Stuttgart): Etnopsîkolojî û trawma
- Jaffer Sheykhislami (Toronto): Sosyolinguîstîk an zimannasî û civaknasî
- Janroj Yilmaz Keleş (London): Medya û Civak
- Xalid Hisên: Helbest û Semîyolojîya Wêjeyê
- Serdar Ay, Adnan Çelik (Paris): Sosyolojî, Antropolojî û Wêje
- Joanna Bochenska (Krakowie): Wêje û Wêjeya Kurdî
- Luqman Guldivê: Wêjeya gelêrî û lêkolînên li ser folklor û zargotinê

Ji 8ê nîsana 2020an ve Kurdolojî Online dest bi bernameya semîner û waneyên xwe kiriye ku ev bername dê Roja Zimanê Kurdî anku 15ê gulana 2020an bi dawî bibe. Wane bi rêya bernameya Zoomê dihên dayîn. Semîner hemû dihên tomarkirin daku piştra ji bo arşîvên Zanîngeha INALCO, Rojava û Newrozê bihên şandin.

Piştî hemû dersan, her xwendekar dê li gorî metodolojîya dersan biçe û lêkolînekê bike. Ew ê lêkolîna xwe 8-10 xulekan li hember civakê pêşkêş bike. Bi dû ra ew ê guh bide nîqaş û pêşniyaran. Axir, ew ê ji nû ve li ser lêkolîna xwe bixebite û gotareka di navbera 4-8 rûpelan da bi nivîskî pêşkêş bike. Mamoste dê li ser gotaran bixebitin. Ew gotar dê li ser navê xwendekaran weke pirtûka “Kurdolojîyê” werin çapkirin. Yê ku gotaran li gorî rêbazan pêşkêş bikin, dê sertîfîkayeka taybet bistînin ku ev sertîfîka ne fermî ye, lê tenê ji bo qada kurdî û dezgehên kurdî dibe referansa wan. ■



أم

أولاد الحرام هؤلاء

حتى كتابا مقدسا لم يقرؤوا

محرومون من الحب

خروفي (1) بقي في المهد

يديا استحالتا شجرة يابسة

و لم نحضن بعضنا

طفل

كنت أقول ربما

هذه أيضا لعبة

دائما أستغيث

لا أحد يغيثني

الكرة التي اشتراها أبي

بقيت في فناء البيت

ترى من سيلعب بها

لم يتبق أحد ؟

معلم

كم كنت أشعر بالسعادة

أعلمُ الأطفال

الصدقة و الأخوة

لم يقرع جرس الفرصة بعد

لماذا هذا الموت

و على اللوح بقيت منتصفه

كلمة النجاح

راعي

كان قد ولدَ للتو

صغيرُ العنزة الجميلة

لم يكن قد رضع الحليب بعد

أنا لا أخجل من نفسي

فلتعلموا

أدفنونا معا

أرجوكم

مع الكلب المسعور

شاب

كنت قد أشرتيت خاتماً

من أجل وردة ربيعي

ها نحن قد غادرنا معا

أعطوها لشخص آخر

فأنا ما عدت بحاجتها

شاعر

من كان يقول

ستكون قصيدي معبرة بهذا القدر

بأن قلمي أبداً

لم يريق الدماء

انسانية

أنتم مئّم معاً

بمساواة , باخاء

الخزي و العار من نصيبنا ! ■

(١) هي كلمة تحب تنادي بها الأم الكردية

صغارها

قصائد مختارة للشاعر Berken Bereh ”بركن بره“

ترجمة: عمران يوسف

سامحوني

أنا

أعصرُ ضحكاتي و آمالي

قلبي و محبتي

و على آلامكم، عذاباتكم و جراحاتكم

أرسلها

ان لم أكن قد استأذنتكم

فلتسامحوني

رغبة

أرغبُ


فقط أن يعرفَ

ذاك القلب المدللُ

ذاك القلب الجميلُ

ذاك القلب الرقيقُ و الطفولي

الأمَّ و العذابَ



19

الشاعر بركن بره شاعر كردي ولد في مدينة شرنخ في كردستان الشمالية (شرق تركيا) عام ١٩٥٧، صدر له حتى الآن ٦ دواوين شعرية و يعتبر أحد أبرز كتاب الشعر الكردي الحديث.





التحضير لموسم الحصاد في ظل الحجر الصحي



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

العدد (٧٣) ٢٠٢٠/٤/١ م